Osman Sebrî di vê hejmarê de jî li ser jîna Napoliyon berdewam dike û ew li ser malbata Bonapert dibêje:Malbeta Bonapert ji malbeteke Talyanî ye û demeke dirêj di girava Korsîkayê de bi cih bûbûn,ew di pêşiya xelkê giravê de bûn,lê ew bi mal û dewlemendiya xwe hinekî bi şûnda ketibûn, Karlo bavê Napoliyon ji (19) saliyê de bawernama advokatiyê istandbû û di wê salê de jî bi keçeke panzde salî re zewicî.Napoliyon li paytexta giravê,bajarê Ejaksiyoyê di (15) Tebaxê, sala 1769 an de hate dinê, birayê wî jozêf ji wî mezintir bû.Karlo û Lêtsiya bîst salan bi hev re jîneke berxudar ajotin û heyşt zarok wan hebûn lê Napoliyon kurê wan yê duhem bû,bavê wî zû dimre, diya wî belengaz dibe, ewa dere cem tiyê xwe, lê tiyê wê jî dimre .
Herweha jî Osman Sebrî di bin navnîşaneke kurt de (biçûkiya Napoliyon) hin agahiyên sudar bi xwendevanên kovarê dide nasîn .

Dûmahîk heye
26.10.2023

Dr.Ebdilmecît Şêxo : Rola Kovara (Ronahî) di pêşketina çand û çapemeniya Kurdî de

Xelek (3) Gotar di (Ronahî) ,hejmarên (15,16.17) ê de

1-(Dawiya sefer û Împeratoriyeyê),xwediyê kovara Ronahiyê.2 -(500000 Firansiz)nivîskar ne diyar e.3-(Veger bi baskekî şewitî),Silêmanê Ferho.
4-(Cindiyê Japanî),Dilawer Çarpîne.5-(Reşbelek ji xwendevanê me ê bercot),Erefat.6-(Amediyê û sûlav) S.Reşîd Amedî .7-(Mînerv) Roja .
8-(Qewetên keleha Ewropayê),Hesenê Mistê .(Hejmar 15).
Lê di hejmara (16) an de hinek ji wan ev in:1- (yên ko dizanin)2- (Qanon û adetên zewacê),Qedrî Ferman .3 -(Beraz û Berazî),Osman Sebrî.4 -(Dîroka jîna Napoliyon),Osman Sebrî.5 -Cejna Kurdan ji taca Îngilêstanê re (Hesen Şiyar).6-Bi qeflêre li ser riya Mûrmanskê ,(Xelîlê Kenco),7-(leklêrk û Firansa şervanî),Ronahî .8-(Girtiyê keleha Ewropayê),nivîskar ne diyar e.
Di hejmara 17 an de 1-(Yohenes Gutênbêrg (1400-1468),Herekol Ezîzan.2-(Nêçîr, nêçîra Hirçan ,nêçîra keftaran ,nêçîra koviyan , nêçîra roviyan , nêçîra kêveroşkan , nêçîra masiyan , nêçîra kewan) Osman Sebrî .3-(Eşîra Zirikan)Hesen Hişyar.4-(Şêxê Berazan çawa firandin ?) nivîskar ne diyar e.
5-(Girava jinan û girava mêran)Evdilezîz Metwar.6-(Dîroka jîna Napliyon),Osman Sebrî. 7-(Bi ser kelehê de girtin û pê li pira wê kirinê) Ronahî .8-(Rê ji ber winda),M.Beşîr Hesenî .
Emê li jêr li hin mijarên jor vegerin û bi kurtasî hewil bidin; kanî kê çi nivisiye?
Em hemû dizanin şerê cîhanê yê duhem di navberên van salan (1939-1945) de bûye,gelek dewletên mezin di vî şerî de li ser du eniyên hevdij hevpar bûn1- Hêzên dewletên hevbend .2-Dewletên navbendî,lê ev şerê mezin bi hêrişa Almanan li ser Poloniya di sala 1939n de dest pê kirîye.
Lewra jî xwediyê (Ronahiyê) Celadet Bedirxan di gotara xwe ya bi navnîşana (Dawiya sefer û Împeratoriyê) de dinivîse:Şerê Ewropayê li (1) Îlona sala 1939 an de di zikê Ewropayê de dest pê kir û welê dixuye ko mezeferên vî şerî ên pêşîn li Efrîqayê di erdekî ji Ewropayê 50 kîlomêtrî dûr de,dê winda bikin û ji xwe winda kirin.
Li 8 Gulanê danezanên hevalbendan daye zanîn ko eskerên hevalbendan (Îngilîzî,Firansiz,Emêrîkanî ketine bajarên Tunisê û Pîzêrtê,Talyan û Elemanan ji ber baz dane;hin hêsîr bûne, ên mayîn kişiyane nîvgirava Bonê; bi vê zefera mezin sefera Efrîkayê ya ko ji sê salan de dom dike gihaştiyê dawiyê,peravên Efrîka Bakur û peravên behra spî yên nîvro;ji Swêsê heta bi Cebel Tariqê,tevde ketine destên Îngilîz û hevalbendan û Behra Spî bû golek ji xwînê. Celadet Bedirxan hîn pêvajoka şerê cîhanî bi hûrgilî şirove dike û xwendevanên kovara xwe bi zelalî agahdar dike .
Lê Dîlawerê Çarpîne di gotara (Cindiyê Japonî) de dibêje: Li cem me li Kurdistanê cindiyê Botan heye û bi mirina xwe bi nav û deng e û jê re mirina Botanî dibêjin,lê emê îro qala cindîyekî din û mirina wî bikin, diyaneta japonan diyaneteke ecêb e,li nik japonan Mîkado yanê Împiratorê wan di yek wextê de xwedayê wan e jî,ji bona wî dijîn ,ji bona wî û bi emirê wî dimrin.Nivîskarê gotarê li ser zimanê kapîtanekî Emrîkî dinivîse: Japanî çiqas bikevin tengiyê jî ,teslîm nabin,gelek caran gava cih li wan pir teng dibe,destên xwe radikin yan destmaline spî li ba dikin,lê ji vê mexsedê dîsan ne teslîmbûn e, ew pê neyarên xwe dixapînin.
Dîlawer Çarpîne hîn li ser zimanê kepîtanê Emêrîkî berdewam dike û dinivîse: Di 27 Şibatê de deh japanî li me qelibîn, gava me çav bi wan kir,em li erdê pehn bûn, beriya wan, me dest bi agirkirinê kir, bi japoniyan re tifingine timatîk hebûn,japaniyan xwe dane ber daran û li me vegerandin û her bi vî awayî berpirsiyrê Emêrîkî pesnê leşkerên japaniyan dide.

Lê Qedrî Ferman dixwaze di gotara xwe(Qanon û adetên zewacê) de li nik hin miletên biyanî bide nasîn, ew weha dinivîse :
1-Li welatê Eskîmoyê de heke mêr li jina xwe xist,jinik dikare telaqê bixwaze,heke jinikê deng ne kir, diya jinikê dikare keça xwe ji mêrik bide berdan .
2- Li Çînê; heke mêrik li jina xwe xist, li gora adetê,mirovên jinikê li pêş mirovên mêrik ve heyşî çovî li wî didin .
3- Li nik Hindiyên sor yên Emêrîkî; herçî zarokê ko ji diya xwe li şûn ko bi serî ve bê, bi lingan ve hat,wî dikujin ji wan ve, ew zarok çîft e.
4-Xelkê Romaniyayê gelek caran li hêviya roja dewatê namînin û beriya wê bi heftekê zave bûkê direvîne .
Wêjevan û siyasetmedarê nasdar Osman Sebrî li ser jiyana Napoliyon Ponapert dinivîse:Ez dibêjim tu xwendevan nînin ko navê Napoliyon ne bihîstine,lê gelek ji wan dîroka jîna vî serdarê mezin bi zarê Kurmancî nexwendine ji ber ku û xasima ji gelparêzan re şîretnameyeke mezin e.Osman Sebrî çend bendan(xelekan)li ser N.Ponapert diweşîne,ew dibêje:Min ji dîroka N.Ponapert gelek sud dîtine û ewî ramanên nû êxistine serê min.
Dîroknivîsên hemû miletan der heqê N. Ponapert gelek tişt nivîsandine, ji van dîroknivîsan her yekî Napoliyon bi awakî daye nasîn,bi çavên hinekan,ew dêwekî welê zorbaz bûye ko textên Şah û Padîşrhan hilweşandiye û bi milyonan mêr dane kuştin … ,lê bi çavên hinekan, ew Melekek ji Melekên xwedê bû; ji bo ko Firansizan ji bela serxwebûnê bifilîtîne hatibû şandin.O.Sebrî hîn dibêje:Li dawiyê gotinên li ser Napliyon hatine kirin nabin yek.
Lê Xelîl Genco di gotara xwe ya bi navnîşana(Bi qeflêrê li ser riya mûrmanskê de) dinivîse:Îngilîz û Emêrîkanî ji hevalbendê xwe Ûrus re nemaze bi du riyan çek û cebirxanan dişînin,li nîvro di Xelîca Faris re û li Bakur di bendera Mûrmanskê re û zabitekî Emêrîkanî bi navê Norman Adams yê ko çend caran bi wan qeflan re çûye û ewî gotiye: Di hewake xweş de me da behrê tu talûke û teşxele ne dihate bîra me,gava em gihîştin avên Eyslandayê zabitekî Îngilîzî bi xwînsarî gote me du rojan em bi selametî çûn di roja siyan de îşareta xeterê dane me,di nav ewran re balefireke Almanî derket û di ser me re geriya,lê balefirê nêzîkî li me nekir û vegeriya nav ewran.
Gava hicûma pêşîn dest pê kir; ez di oda xwe da bûm,sê balefirên Almanî bi ser me de girtî bûn û bera me didan û topên berbalefirê li wan vedigerandin.
her du alîyan agir dikir,ji alîkî agir bi hewa diket,ji aliyê din ber bi jêr dibû,gava ez li xwe zivirîm,min dît bombe bi temamî li alîkî vapora me ketibû.Bi vê rengî gotarnivîs panorameke gîştî li ser vê cengê ji xwendevanên xwe re berçav dike .
lê; sernivîserê kovarê di gotara xwe ya di bin navnîşana (Girtiyê keleha Ewropayê de)dinivîse:Hinan gotibû ko Hitler Napoliyon e,Napoliyonê Almanî ye,Napoliyonê sedsala bîstan e,hin dibêjin ko Hitler bi xwe jî di fikrê de ye, ewî jî bawer dikir ko Napoliyon di wî de vejiyaye.
Herçî tarîxa cengên dinyayê xwendine qenc dizanin Napoliyon çi serdar, çi Dehakê eskerî bû, Napoliyon sê tiştên mezin dabûn ber bi çavên xwe:
1-Ber bi rohelê fireh bûn û şikestina ordiwên Rusî.2-Hakimîyeta Behra Spî, bi destxistin û vegirtina Kişwerê Misrê.3-Li behrekê 35 kîlomêtran dirêjbûn û şikastina Îngilistanê,Napoliyon gihîşte Moskoyê. Napoliyon derbasî Ffrîqayê bû û beriya ko dirêjî Qah-

Rûpel 13

Dûmahî : ÇEWISANDINA KURDAN LI HUNDIR Û DERVEYÎ TURKIYAYÊ DI RAPORA "HUMAN RIGHTS WATCH"Ê YA SALA 2023YAN DE

"tawana berxwedana li dij polîsan an jî jihevbelav nebûn".
Her çiqas ku siyasetên çewisandina kurdan sînorê Tirkiyayê jî derbas dike, rapora "Human Rights Watch"ê ya taybet bi Tirkiyayê di beşê bi sernavê "kêferata kurdan û çewisandina oposizyonê-" de, balê dikişîne ser siyasetên çewisandinê yên li dij kurdan li dervayî Tirkiyayê jî. Ji wan jî, guhdana Tirkiyayê di "hemleya xwe ya leşkerî li dij PKKyê bi derbeyên balafirên bêmirov li Herêma Kurdistanê).. her wiha zêdebûna êrîşan li Bakur û Rojhilatê Sûriyayê li dij HSDyê.. Di vê çarçoveyê de, balafirên şer ên Tirkiyayê di cotmehê de binesaziyên girîng wêran kirin û av û kehbrebe li ser bi milyonan kes qut kir". Ev mijar taybet, em ê di rapora Human Rights Watchê ya derbarê Tirkiyayê de û di rapora wê ya salane ya derbarê Sûriyayê de bibînin.
Her wiha, ya balkêş jî derbarê hebûna Tirkiyayê li Sûriyayê Human Rights Watchê gotina "dagîrkerî" bi kar anî, bêyî ku tu peyvên din ên ne zelal bi kar bîne. Di vê çarçoveyê de di raporê de hate gotin: "Tirkiya dagîrkeriya axa li bakurê Sûriyayê berdewam dike, ku wekîlên wê yên sûriyayî (komên opozîsyonê yên çekdar) mafên sivîlan binpê dikin û bêyî ku werin cezakirin". Ev yek jî bi berfirehî di rapora wî ya derbarê Sûriyayê de hatiye dubarekirin, ku di beşekî taybet de ya bi sernavê "axa ku Tirkiyayê li bakurê Sûriyayê dagîr dike" îşaret bi vê yekê dike. Di vê çarçoveyê de, Human Rights Watchê di rapora xwe ya derbarê Sûriyayê de bi bîr xist ku"li axa ku Tirkiya li bakurê Sûriyayê dagîr dike, komên cuda yên Artêşa Niştimanî ya Sûriyayî û polîsên leşkerî ku ev hêz ji aliyê hikûmeta sûriyayî ya demkî ve hate avakirin ji bo sînorekî ji binpêkirinên koman re deyîne, bi dehan binpêkirinê li dij bi dehan kesan pêk anîn, bêyî ku werin cezakirin. Binpêkirinê ku pêk anîn jî wekî girtin, desteserkirina bi zorê, windakirin, îşkencekirin, îşkenceya seksî û dadgehkirinên leşkerî yên neadil."
Her wiha tiştekî din ê balkêş di raporê de ku hate bibîrxistin heye, ew jî ku Amerîka sala 2023yan careke din Tirkiya xist lîsteya dewletên ku "destên wan di bikaranîna leşkerê zarok de heye, ew jî wekî bertek bû bo piştgiriya wê ji komikên Artêşa Niştimanî re yê ku bi leşkerkirina zarokan tên tawanbarkirin", ev yek jî rûyê din ê cewher û rola Tirkiyayê nîşan dide ku hewl dide serweriya xwe berfireh bike, heta ku li ser pişta zarokan be jî ne xem e.
Lê tiştê ku di raporê de nehate gotin, ku behsa navên herêmên "komên Artêşa Niştimanî ya Sûriyayî binpêkirina mafên sivlîan li ser malûmilkan û axê dewam kirin, di nav de jî destdanîne ser malan û axê û bazirganiya bi darê zorê" nehatiye kirin. Heta niha bi sedhezaran ji sûriyayiyan ku di pêvajoya operasyonên leşkerî yên Tirkiyayê de dev ji malên xwe berdane û ew niha koçber in û ji malûmilkên xwe bêpar in" ku tê de îşaret bi van kiryaran kirine. Herêmên ku têde desteserkirin bi darê zorê çêbûne bi awayekî sereke Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî ne û taybet malûmilkên kurdên sûriyayî ne.
Di rapora xwe ya derbarê Sûriyayê de û di beşê girêdayî "Bakur û Rojhilatê Sûriyayê" de, raporê kiryarên Tirkiyayê yên di salekê de bi çend gotinan puxte kir û got: "Ji ber êrîşên bi balafirên dron ên hêzên Tirkiyayê sivîl hatin kuştin û birîndarkirin". Lê di raporê de, xîtabeke ne zelal derbarê pirsgirêka avê ku Tirkiyayê sedema wê bû bi kar anî û wekî kêferateke avê di navbera Tirkiya û Rêveberiya Xweser de dît, ji ber ku pirsgirêka avê ji ber kêmkirina Tirkiyayê ji para avê ya Sûriyayê kêm dike û stasyonên avê jî bombebaran dike. Her wiha serdestiyê li stasyona Elokê ya li Serê Kaniyê dike. Encama ku rapor giha wê hûrbîn bû, ku pirsgirêka avê hişt ku "derdora milyon kesî li bajarê Hesekê û derdora wê ji mafê peydakirina avê bêpar bimînin"
Li kêleka binpêkirinên Tirkiyayê li Tirkiya û Sûriyayê, di raporê de beşekî taybet ê girêdayî Iraqê hebû û bal kişand ku Tirkiya êrîşên esîmanî bi awayekî domdar û reşkujîyên armanckirî li Herêma Kurdistanê pêk tîne, ji ber van êrîşên Tirkiyayê jî "sivîl têne kuştin". Di tîrmeha 2023yan de, "4 kesên ku rizgar bûn an jî şahidê êrîşa esîmanî ya Tirkiyayê bû ku tê gotin nexweşxaneyeke sivîl li Şingalê hate armanckirin û di encamê de 8 kes hatin kuştin, giliyekî fermî li Encûmena Mafên Mirovan a girêdayî Neteweyên Yekbûyî kirin. Iraqê jî gelek caran êrîş şermezar kirin û ev êrîş wekî binpêkirineke serweriya xwe didît, lê heta asteke mezin ev êrîşên ku çêbûne lêpirsîn venedikir an jî qerebû bo qurbaniyan nehatin pêşkêşkirin"
Bi awayekî giştî, rewşa çewisandin, armanckirin û binpêkirinên Tirkiyayê yê mafên mirovan û şerê vekirî yên siyasî û yê din ê leşkerî li dij kurdan, asta sînorê Tirkiyayê derbas dike û ji salên 90 ve gihaye asta herêmî. Lê bilindûna vê asta dijminatiyê hevdemî dagîrkirina beşên ji deverên kurdên sûriyayî û avakirina baregeh û xalên leşkerî yên xwegir li Herêma Kurdistanê, ji me re dide xuyakirin ku dê şer berdeam bike û di demên nêz de dê mezintir bibe, ku awayê armanckirina Tirkiyayê li Sûriyayê êdî wekî tawanên şer ku amrazên qirkirinê tê de hene, tên dîtin.

Jêder : Navenda Kurdî ya lêkolînan

ÇEWISANDINA KURDAN LI HUNDIR Û DERVEYÎ TURKIYAYÊ DI RAPORA "HUMAN RIGHTS WATCH"Ê YA SALA 2023YAN DE

Rewşa mafên mirovan a ji bo kurdan di sala 2023yan de li Tirkiya, Îran û Sûriyayê hîna zêdetir bi paş de vegeriya û rastî têkçûnan hat. Human Rights Watch ku rewşa kurdan li her dewletekê cuda dişopand û ne di çarçoveya operasyonên çewisandinê de yên dervayî sînor behsa wan dikir, ku êdî ev yek bûye taybetmendiya siyaseta Tirkiyayê ya ku di heman wextê de kurdan li hersê dewletên borî hedef digire. Ev yek jî nîşan dide ku rolên Tirkiyayê yên di çewisandina kurdan de, êdî sînorê herêmî yê dewletê derbas dike û êdî bûye şerekî vekirî, ji ber binpêkirinên mezin ên mafên mirovan û sûcên şer ku gihaştin asta şerê qirkirinê ku li hember wê bêdengiyeke navdewletî heye.

Ji bo hundurê Tirkiyayê, rapora salane ya di bin sernavê "Di sedsaliya Tirkiyayê de, siyasetkirina dadgehan û bêdengkirina dezgehên ragihandinê" de, bal kişand ser siyasetên xapandinê ku AKP di dema hilbijartinên gulana 2023yan de bi kar anî, kir. Di vê çarçoveyê de, hikumeta Erdogan xîtabeke gelêrî ya xanpînok bi kar anî ku di nava partiyên oposizyonê de parçebûneke dijwar çêkir û "bi domdarî CHP bi desteka PKKyê tawanbar kir û dîmenên derew ku Kemal Kiliçdaroglu ê CHPyî bi rêveberên PKKyê re, belav kirin". Lewra bikaranîna Erdogan a vê propogandeya pûç a têkiliya di navbera hevrikê wî û rêveberên PKKyê de, armanca Erdogan ji vê yekê ew bû ku berbijêrê tirk ê şovenîst ber bi xwe ve bikşîne û alîyên faşîst ber bi xîtaba dijî aştiyê ve bibe. Lê hewldanên oposziyona "maseya şeş" ên bersivdayîna gotegotên AKPyê an jî îşaretkirina li ser rastiyekê ku Erdogan bi xwe hewl daye bi PKKyê re di pêvajoya aşitiya kurdan û Tirkiyayê de, bikeve danûstandinan, hebûn. Her wiha, hikumeta Erdogan dezgehên ragihandinê yên herî girîng di bin serweriya wê de bû, hişt ku bernamezetê oposizyonê yê serokkomariyê li dij PKKyê gotinan bibêje, vê yekê hişt ku gelek sarbûn bikeve helwesta hilbijêrên kurd ku Erdogan rêjeyek ji wan danî pêş sê bijartekan: Bijartina alîyê faşîst ya ku hevalbendiya serdest nûnertiya wê dike, an jî bijartina berbijêrê opozîsyonê yê ku helwesta xwe li hember "Karkerên Kurdistanê" mezin kir, an jî beşdar nebin û tu kesî nebijêrin.

Her wiha, di nava îsbatên ku Human Rights Watchê bal kişand ser, siyasetkirina dadwerî ku HDP rastî wê hat û di encamê de maseya wê hat girtin û li dadgeha destûrî ya Tirkiyayê biryara wê nehat dayîn. Ji ber vê yekê HDPyê ji alîgirên xwe xwest ku deng bidin Partiya Çep a Kesk ku 61 kursî bi dest xistin. Her wiha, di şirovekirina siyaseta çewisandinê ya rejîma Tirkiyayê de, di raporê de hate gotin ku bi dehan serokên şaredariyan û endamên parlamentoyê yên berê yên HDP û berpirsên wan ketine zindanên bergiriyê yan jî bi sûcên terorê ceza li wan hatiye birîn, ji ber çalakiyên xwe yên siyasî yên rewa yên ne tund û xîtabên wan û belavbokên wan ên li ser medyaya civakî, ji nava wan jî hevserokên berê yên HDPyê Selahedîn Demîrtaş û Fîgen Yuksekdag ku ji 4ê mijdara 2016a di girtîgehê de ne, tevî ku dadgeha Ewropayê ya mafên mirovan biryara derketina wan demlidest da.

Her wiha, di beşê taybet ê li ser "azadiya vegotinê" de, raporê bal kişand ser mekanîzmeya hikûmetê ya serweriya li ser saziyên dewletê, nexasim dezgehên ragihandinê yên hikumetê û bihêle ku biryaran bide ji wan biryaran "encûmena bilind a radyo û televizyonê" ku desteyeke weşana piştgiriya hikumetê organîze dike ku"bacên bizorê li ser kanalê TVyê yên ku hikûmetê rexne dikin ferz kir, bi taybet kanala `Xelq TV`ew jî bi seba gotinên ku di dema hilbijartinan de li ser platforma xwe

weşandibûn. Ji nav kanalên ku bac û ceza li wan hat ferzkirin kanala `Tele 1` bû, ku seredîtorê wê Mîrdan Yanardag di 27ê hezîranê de bi bihaneya gotinên wî ne li dij Ebdulah Ocelan in, hat girtin. Ev yek jî nîşan dide ku tawan amade ye ew jî bibîrxistina navê Ocelan e, bê tehrîkirina wî an jî li ser hizirên wî, dibe ku ev yek jî bi serê xwe tawanek be. Di dawiyê de, Yanardag di rûniştina yekem a dadgeha wî de di 4ê cotmehê de piştî dadgekirina wî bi tawana "belavkirina propogandeya terorê" û " amajepêkirina bi sûc û sûckaran" ji zindana bergirî hate berdan, ku hukumê 30 mehan lê hatibû birîn. Her wiha, di tebaxê de, televizyona "Tele 1" ji ber daxuyaniyên Yanardag, cezayê ku 7 rojan weşanda xwe rawestandin li ser hate birîn û ev yek jî cara yekem tê kirin.

Di heman beşê raporê de, hate gotin ku rojnamevanên kurd pêkan e bên armanckirin "bi awayekê neguncav". Di vê çarçoveyê de, di raporê de bal hate kişandin ku çawa dadgehkirina li Amedê 18 rojnamevanên kurd bi tawana "tevlîbûna nava rêxistina terorîst" hatin cezakirin, ku 15 ji wan jî 13 mehan ketin zindana bergirî beriya ku di rûniştina yekem a di tîrmehê de werin berdan. Her wiha, di dadgehkirina li Enqerayê de ku 11 rojnamevanên kurd tê de hebûn, 9 ji wan jî 7 mehan ketin zindana bergirî beriya ku rûniştina yekemîn di gulanê de werin berdan. Lewra, sînordarkirina azadiya gotinê ku hejmara rojnamevanên kurd ji yê tirkan zêdetir in, asta çewisandina desthildariyê nîşan dide ku hewl dide dengên rojnamevanên kurd qut bike bi rêbazên qanûnî yên siyasetî yên girêdayî desthildariya rêveber ku ev yek jî li dij naveroka destûr û qanûnê ye.

Di beşê bi sernavê

Rûpel 15

Welatiyekî Kurd dema vegeriya bajarê xwe ji aliyê Îstixbaratan ve hat girtin

Di berdewamiya siyaseta girtinên keyfî li ser herêma Efrînê de, dewleta Turk a dagîrker di dîrokên cuda de, tevî sozên ku ji navbeynkarên nêzî desthilatdariyê û desthilatdariyê dabûn, welatiyên Kurd bi tawana têkiliya bi “rêveberiya berê” re girtin. dayîna heqdestan, lê tevî wê yekê, ew têne girtin.
Di vê çarçoveyê de, di 5 Çile de endamên “îstixbarata” polîsên sivîl li bajarê Efrînê welatiyê Kurd bi navê “Henîf Behrî Bekir ku dayîka wî Umniah e û temenê wî 47 salî ye” ji bajarokê Bulbulê yê gundewarên dagirkirî girtin. ya Efrînê, piştî vegera wî ji cihên koçberkirina neçarî bajarê Helebê.
Dema ku ji bo wergirtina nasnameya ku ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hatibû dayîn, serdana Dezgeha Sivîl a bajarê Efrînê kiribû, ji ber ku nasnameya sûrî ji aliyê desthilatdarên dagirkeriyê ve nayê naskirin, hate girtin.
Tevî dayîna "1000" dolar xelata aborî bo yek ji navbeynkarên nêzîkî desthilatdarên dagîrker, li navenda nifûsa sîvîl hat girtin, lê ew hat girtin û niha li Girtîgeha Navendî ya Maarata li bajarê Li Efrînê heta niha û piştî ku bavê wî birêz "Behrî Nebû" nûçeya girtina wî bihîst, kurê wî Henîf gelekî ji vê yekê bandor bû û di 11ê Çileya îsal de li bajarê Helebê bi kuştina bi zorê jiyana xwe ji dest da.

Di vê çarçoveyê de, roja 18 Çile, efserên polîsên leşkerî li xala pişkinînê ya “Şett” a ser bi bajarê Ezazê, welatiyê Kurd bi navê “Ebdo Reşîd Henan, ji malbata Hac Abdo, temen 45 salî” ji gundê Culaqa girtin.
Navçeya Bulbulê ku li gundê Qestal Xudrianli yê Efrînê ye, welatiyê bi navê Faîq Reşo yê bi nasnav Faîq Kasbah jî hat girtin, dema ku bi Abdo re diçû bajarê Ezazê bi tirimpêla Hyundai re diçû bajarê Ezazê. ji bo kirîna “Culphator” ji bo ku zevî bikire, ew hatin girtin û otomobîl hat desteserkirin, welatiyê bi navê Faîq hat berdan û yekser bertîl hat dayîn, lê welatiyê bi navê Abdo Reşîd Henan birin navenda polîsên leşkerî li bajarê Ezaz bi tometa danûstandina bi rêveberiya berê ya Efrînê re, hê jî di nav çarenivîseke nediyar de di girtîgehê de ye.
Tê zanîn ku çekdarên Firqeya nehan ku kontrola gund dikirin, berî salekê ew revandin û dest danîn ser otombêla wî û tenê piştî dayîna fidyeyê bêyî berdana otomobîlê hat berdan û ev jî bû xenîmet bo wan.

Girtinên berfireh li gundê Goliyê jêrîn ser bi navçeya Reco ya herêma Efrîna dagirkirî, bi behaneya ku we berê bi rêveberiyê re kar dikir

Çalakiya girtinê ya li gundê Goliyê jêrîn ser bi navçeya Reco ya herêma Efrînê yê dagirkirî, bi behaneya ku we bi rêveberiya berê re kar dikir.
Endamên “îstixbarata” polîsên sivîl êvariya îro Sêşemî 23ê Çile, 2 welatiyên Kurd ên xelkê gundê “Goliyê jêrîn” – navçeya Reco ya ser bi gundewarê Efrîna dagîrkirî, bi tawana erkdarkirina nobedariya sivîl di dema rêveberiya berê de girtin. Du welatiyên ku hatin binçavkirin ev in:
1- Mistefa Mihemed Bekir, 33 salî, pîşeya wî şivantî ye.
2- Mihemed Mehmûd Silêman, 53 salî, bi nasnavê “Ebû Akîd”, pîşeya wî “Meemercî” ye.
Ew ji mala wan li gund hatin girtin û birin navenda "îstixbarata" polîsên sivîl li bajarokê Racû, û ew heta niha di zindanên keyfî de ne.

Bêhinvedanek digel xwendevanan

Ji bo serxwebûna welatan û Azadiya Gelan herdem gotina Apê Ho tê bîra mirov :
Ji serxwebûn û Azadiyê bi Rûmetir tiştek nîne
Ger mirov ji dil de xebatê neke wê herdem barê bindestiyê bikişîne

Aqilekî stratejîk hewce ye

Diktor Kemal Sîdo, Pisporê Rojhilata Navîn ê GfbV´yê: Ti girîngiya xwe nîne ka tu dilxwazê kîjan partiya Kurdî yan jî kê ji xwe re Serok dihebinî, lê Efrîn mijareke neteweyî ye û jê re aqilekî stratejîk hewce ye. Kurd dikarin li dor vê werin cem hev.

Hefteya bihurî rêxistinên mafê mirovan li Karlsruhê serî li Dozgeriya Federal a Elmanyayê dan û giliyê dewleta Tirk û çeteyên wê yên li Efrînê dagirkir kirin ji ber sûcên wan ên şer û sûcên li dijî mirovahiyê. Navenda Destûrê û Mafê Mirovan a Ewrûpayê (ECCHR), Sûriyeyiyên ji bo Heqîqet û Dadê (STJ) li Karlsruhe, li Dozgeriya Federal a Elmanyayê giliyê dewleta Tirk û çeteyen wê kir ji ber sûcên wan ên li Efrîna dagirkirî.

Neh (9) mexdûrên dagirkeriya dewleta Tirk ên Efrînî yên ku ji ber sedemên ewlehiyê, navê wan tê veşartin, bi rêya van saziyên navbirî gilî kirin. Piştî ku dozgeriyê li van sûcan kola wê biryarê li ser bide, bê ka ew ê dozê veke yan na.

Kemal Sîdo, Pisporê Rojhilata Navîn yê Rêxistina Gelên di Tehlûkeyê de ya navenda wê li bajarê Elmanyayê Goettingenê, di pêvajoya hazirkirina gilî de bi zanîn û belgeyên xwe destek daye. Kemal Sîdo diyar kir ku ev doz wê mirovên din jî wêrek bike û divê bidome.

Sîdo bal bire ser helwêsta dirû ya li biwara sûcên dewletan û got, ‘‘Kesên ku dema mesele Çîn û Rûsya be, dengekî bilind derdixin, dema ku mijar dibe sûcên dewleta Tirk xwe kerr dikin, ji hêla mafê mirovan ve ti baweriyê nadin mirovî.‘‘

Ji ber ku Tirkiye giring e!

Kemal Sîdo bi berdewamî xwest ku di medyayê de, li nav raya giştî tim Efrîn di rojevê de be, li ser were axaftin û got, ‘‘Li Efrînê dewleta Tirk derî qanûn e. Mirov bi rehetî dikare vê ji cîhanê re vebêje, lê aliyê din jî zor e, çimku dewleta Tirk endama NATO’yê ye. Li Elmanyayê siyasetvanên min î dost, ên ji Partiya Keskan hene, dema ku guh didim wan, dibêjin,‘Tirkiye welatekî girîng e.’ Ji ber ku Tirkiye welatekî giring e, dema ku heqê mirovan binpê dike, qey divê mirov bêdeng bimîne? Rûsya jî welatekî giring e, naxwe dema ku wê jî tiştek kir, em li biwara Rûsyayê jî bêdeng bimînin.”

Efrîn mijareke netewî ye

Dr. Kemal Sîdo bi berdewamî xwest, mirov giliyê neh Efriniyan bişopîne û wiha peyivî: ‘‘Di halê normal de, ji bo ku li devereke weke Efrînê ji bo belgeyên sûc werin danîn, bibin rapor, mexdûr biaxivin pere têne xerckirin, lê li nav me, ji bo ku mirov bêdeng bimînin, neaxivin pere têne xerckirin. Divê guhê me li Efrînê û vê dozê be. Divê em her zextê çêkin û raya giştî ava bikin. Dagirkirina Efrînê bi tena serê xwe sûc e. Li dijî hiqûqa navdewletî sûcekî eşkere ye. Ji ber ku Efrîn ne bi ser Tirkiyê ve ye, lê ji hêla qanûnî ve bi ser Sûriyê ve ye. Li wir, li her buroyê wêneyên Ataturk û Erdogan hene, her dever bi alayên Tirk hatine pêçan. Tirkî û Erebî zimanê fermî ne û Kurdî hema bibêje qedexe ye. Bi dilê Beşar Esad e jî ku Efrînê bikin Ereb yan jî Tirk. Ti giringiya xwe nîne ka tu dilxwazê kîjan partiya Kurd î yan jî tu kê ji xwe re Serok dihebinî, lê Efrîn mesleyeke neteweyî ye û jê re aqilekî stratejîk hewce ye. Kurd dikarin li dor vê werin cem hev.

Elmanya li ser Efrînê bêdeng e

Efrîn ne meseleya partiyan e, ji bo Kurdan meselekeyeke netewî ye. Her wiha ji bo ku her roj mafê mirovan lê têne binpêkirin, bi rengekî derî hiqûqa navneteweyî, ji bo ku hikûmeta Elman bi dewleta Tirk re dost e, ji bo ku li ser siyaseta Tirkiyê bêdeng e, di mijara Efrînê de tiştekî ku wan motîve bike nabînin. Jê jî wêdetir, ditirsin ku wan jî bi YPG’ê re têkildar bikin û bi wan re bikevin nav gelemşeyekê. Mînak li ser şerê Ukrayna hikûmeta Elman pirr çalak e. Di şerê Ukraynayê de ji bo ku li sûcên Rûsyayê bikole, pereyan xerc dike. Dema ku mesele em in, pereyan didin da ku Kurd bêdeng bimînin. Ne li sûda me ye ku li Efrînê dagirkeriya Tirk domdirêj be. Pirraniya nifûsê halê hazir Ereb e û dikarin referandûmê bikin û dikarin bibêjin, binihêrin va gelê wir dixwaze tevî nav Tirkiyê bibe.

Ev doz belkî gaveke piçûk be, lê deng veda. Ji meseleyên wiha re wext divê. Dişibe kolandina bîrê ya bi dest û lepan. Dema ku mirov ji çarçoveya mafê mirovan ve lê dinihêre rastiyeke berbiçav heye û ew jî ev e ku Tirkiye li Efrînê dagirker e û Efrîn ne parçeyekî Tirkiyê ye. Ev doz wê mirovên din jî wêrek bike. Divê mirovan wêrek bike ji ber ku Kurdên li Elmanyayê ji ber siyaseta dewleta Elman hinekî çavtirsandî ne. Yên ku li bara Çîn û Rûsyayê bi dengê bilind diaxivin, dema ku mesele sûcên dewleta Tirk in, xwe kerr dikin, ji alî mafê mirovan ve bawerî bi wan nayê. Li Elmanyayê pirraniya gel ji saziyên siyasetê bawer nake. Heke behsa mafê mirovan dike divê ev ji bo her kesî be. Heke behsa hiqûqa navneteweyî dike ev divê ji bo her kesî be.”

Dijminatiya li Kurdan geş dike

Kemal Sîdo ji bo siyaseta sorkirina xelkê Rojhilata Navîn nexasim jî Ereban li dijî Kurdan jî got, Erdogan û partiya xwe li welatên Misilman her roj diberiya Kurdan geş û gur dikin: “Xilbeyê Kurdan jixwe Misilman in. Dewleta Tirk li pey îslama radîkal e. Mînak, berê Misilmanên li Idlibê li biwara Kurdan ev qasî ne hişk bûn. Piştî ku têkilî dewleta Tirk bûne, dijberê Kurdan in. Neyariya dewleta Tirk a li dijî Kurdan li ti siyasetê nasekine. Kesekî hema hinekî dilxwazê dewleta Tirk be, te dît roja din bû dijberê Kurdan. Berê cîranên me yên Ereb ev qasî ne dijberê Kurdan bûn. Beriya bi çendekê ez li Mekke û Medîneyê bûm. Min li wir hin Senageyî dîtin, gotin,‘Kurd li dijî Erdogan in, ji ber vê li dijî Îslamê ne.’ Min jî gote wan, ‘Tu hêj bi Erebî nizanî, Erdoganê te jî bi Erebî nizane.’ Li Elmanyayê, ji welatên cihê dema ku bi Misilmanan re diaxivim, tiştên weke hev dibêjin.”

Borda Ragihandina "Yekîtî Niştimanî Kurdistan" spasiya Nivîsgeha Ragihandina Navendî ya "Partiya Pêşverû" dike

Spasname

Hevalên hêja endamên nivîsgeha ragihandina "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê"
Silaveke rastgo :
Bi navê borda ragihandin û hemû kadir û medyekarên di Yekîtî Niştimanî Kurdistan de em spasiya we dikin li ser pîrozbahiya ku we ji konfiransê Duwem a ragihandina Yekîtî Niştimanî Kurdistan re şandibû , û em ji we re tekez dikin ku rasparde , pêşinyar û biryarên konfiransa me wê ji bo xurtkirina giyanê hevrêziya netewî û piştgîriya xebata aştiyane ya kurd li hemû parçeyên Kurdistanê wê weke berê be û nayê guhertin..
Di vê derbarê de hêjayî gotinê ye ku rola serok Mam Celal û mamoste Ebdilhemîd Derwîş karîger bûn di xurtkirina bingehên hevkarî û hevbendiyê di navber me de , û ev ji me re bû çandeke zengîn , lewre em di ragihandina "Yekîtî Niştimanî Kurdistan" de pabendbûna xwe bi vê çandê tekez dikin , û li gor rêbaza serok Mam Celal emê berdewam bin di piştgîriya partiya we ya xebatkar de , partiya mamoste Hemîd Derwîş..
Careke din em spasiya xwe ji we re dûbare dikin.

17/1/2024 Z - 2636 K

Letîf Nêrewî : Berpirsê Borda Ragihandina Yekîtî Niştimanî Kurdista

Şandek ji "Partiya Pêşverû" beşdarî rêwresmên kongireya Sêyem a Partiya Sûriya Pêşerojê dibe

Di dîroka /21/1/2024an de şandek ji "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê" li parêzgeha Helebê beşdarî rêwresmên kongireya"Partiya Sûriya Pêşerojê" dibe.
Bi vê babetê şanda partiya me birûskek pîrozbahiyê arasteyî serkirdayetiya Partiya Sûriya Pêşerojê kirin û ev deqa wê ye :

PÎROZNAME
Hevalên xebatkar di rêveberiya "Partiya Sûriya pêşerojê" de
Bi babeta li darxistina kongireya partiya we ya xebatkar em di "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê"de germtirîn silav û pîrozbahiyan arasteyî we dikin û serkeftinê ji xebata we re dixwazin.
Hevalên hêja : Weke hûn zanin Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê di rewşek hestiyar û awarte re derbas dibe lewre em bang li we dikin ku hûn girîngiyê bidin danheva mala kurdî ji bo avakirina biryara rêzanî ya kurdî li Kurdistana Rojava û ji bo pêkanîna xewn û hêviyên gelê me di welatekî azad û demoqrat de.
Di dawiyê de careke din em lidarxistina kongireya we pîroz dikin û serkeftinê ji xebata we re dixwazin.
Bijî xebata gelê kurd - Serkeftin ji doza me ya dadmend re

الحزب الديمقراطي التقدمي الكردي في سوريا - منظمة عفرين
Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê – Rêxistina Efrînê
PÎROZNAME
Hevalên xebatkar di rêveberiya "Partiya Sûriya pêşerojê" de
Bi babeta lidarxistina kongireya partiya we ya xebatkar em di "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê"de germtirîn silav û pîrozbahiyan arasteyî we dikin û serkeftinê ji xebata we re dixwazin.
Hevalên hêja : Weke hûn zanin Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê di rewşek hestiyar û awarte re derbas dibe lewre em bang li we dikin ku hûn girîngiyê bidin danheva mala kurdî ji bo avakirina biryara rêzanî ya kurdî li Kurdistana Rojava û ji bo pêkanîna xewn û hêviyên gelê me di welatekî azad û demoqrat de.
Di dawiyê de careke din em lidarxistina kongireya we pîroz dikin û serkeftinê ji xebata we re dixwazin.
Bijî xebata gelê kurd
Serkeftin ji doza me ya dadmend re
P.D.P.K.S
Rêxistina Efrînê
الحزب الديمقراطي التقدمي الكردي في سوريا
منظمة عفرين
20 / 1 / 2024 Z – 2636 K
Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê
www.dimoqrati.net pdpks57@gmail.com https://m.facebook.com/PDPKS.SY

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Giştî

Rojnameyeke Mehaneye ji Aliyê Nivîsgeha Ragahandina Efrînê ya Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê Tê weşandin Hejmar (76) Reşemî 2024Z - 2636K

Dengê Pêşverû

Carek din di derbarê Siyastên Turk û Erebkirina Herêma Efrînê de

Ji roja êrîşkirina dewleta Turkiyê li ser bajarê Efrînê , bajar di bin gef û zordariyê de ye , encama qûnaxa yekem ji dagîrkeriya bajêr bi sedan ji xelkê sivîl hatin kuştin , herwiha cihên dîrokî , nexwaşxane , zevî û hêrên zêtûnan hatin armanc kirin.

Piştî Şeş salan Çiyayê Kurmênc herêma ciwan û bêrdar herêma Efrînê li Kurdistana Sûriyê hîn di bin agirê dagîrkeriya dewleta Turk û nandozên wê de ye.Ew berdewamin di talankirina mal û samanên Efrîniyan de, ew berdewamin di girtin û destdirêjahiya li ser gelê meyî mirovhez û azadîxwaz de.

Çekdarên îslamî dizî,revandin û kuştinê li dijî sivîlên kurd pêktînin bi armanca xizankirin û perîşankirina welatiyên kurd , da ku ew neçar bibin dest ji xaka bav û kalan berdin, di heman demê de siyaseteke pilankirî ji aliyê istxbaratên dagîrkeriya Turk ve tê meşandin ji bo barkrina gelê me ji herêmê , û ji bo qirkrin û bidawîanîna hebûna netewî ya kurdî li Efrînê.

Hêzên dagîrkeriya Turkî û çeteyên xwe operesyonên guherîna demoxrafî pêktînin ,û berdewamin di kiryarên dizî û talankirinê de , û di vê çarçewê de hemû cih û şûnwarên dîrokî yên gelê kurd li herêmê dikin armanca xwe û binpê dikin.

Em di Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê de van kiryarên hovane şermezar dikin.

Di heman demê de em ji civaka navdewletî , deste û rêxistinên mafên mirovan dixwazin da ku bi erk û berpirsiyariya xwe rabin , û bi taybetî em ji hêzên xwedî biryar di mijara Sûrî de dixwazin ku dagirkeriya Turkî li Efrînê bi dawî bînin.

1 / 2 / 2024 Z - 2636 K

Desteya Sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Daxuyanî ji nerîna giştî re

Di roja 20 / 1 / 2018an de balafirên Turkî dest bi topbarankirina navenda bajarê Efrînê û gund û navçeyên wê kirin , herwiha hêzên dagîrkeriya Turk û nandozên artêşa nîştimanî ya Sûrî bi hemû çekên xwe yên giran bajarê Efrînê dagîr kirin di encamê de bi sedan pakrewan û bi deh hezaran ji gelê me koçber bûn ji ber topbarankirina bejayî û ezmanî bi ser herêmê de.

Piştî Şeş salan ji dagîrkeriyê heya niha herêma Efrînê rastî tawan û binpêkirinan tê , çekdarên îslamî di dermafê welatiyên kurd de di kiryarên xwe yên ne mirovî de berdewamin ji talan , dizî , û destdirêjiya li ser samanên wan , herwiha girtin , revandin û kuştinê li dijî wan bi kar tînin bi aramanca xizankirin û perîşankirina welatiyên kurd da ku ew neçar bibin ku dest ji gund û bajarê xwe berdin û koçberiyeke firehtir di nav kurdan de were kirin û guherîna dîmografî li herêma Efrînê pêk bînin.

Em di Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê de vê bêtar û felaketê bi xemgîniyeke mezin di dermafê êş û azarên gelê xwe de bi bîrtînin , herwiha em wan cangoriyên ku di ber xak û rûmeta gelê xwe de canê xwe dane silav dikin û bi bîra xwe tînin , û van siyasetên Turkirin û Erebkirinê yên ku dewleta Turkiyê li herêmê dimeşîne em şermezar dikin. Di heman demê de em bang li civaka navdewletî , deste û rêxistinên mafên mirovan dikin ku bi erk û berpirsyartiya xwe rabin , û fişarê li ser Turkiyê bikin da ku dagîrkeriya xwe li herêmê bi dawî bîne , û peydakirina heyamek erênî û parastinek pêwîst ji bo vegera gelê kurd li Efrînê.

19 / 1 / 2024 Z - 2636 K

Nivîsgeha Ragihandina Navendî ya
Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê

Kela Horî we silav dike

Ev Rojname Rojnameya we ye
Ev Deng û Hawara we ye
Zengîn bikin bi gotarên xwe
Ev xewn û Hêviya me ye
Hişmend

E.Mail: altekedome-efrin@hotmail.com Facebook التقدمي عفرين